



RediPlan

Bernameya ji bo rewşa lezgîn



Xwendina Hêsan – Kurdî Kurmancî



Peyvên dijwar


Di vê pirtûkê de hin peyvên dijwar hene.

Cara yekem ku em peyveke dijwar dinivîsin

- peyv bi rengê **şîn** e
- em dinivîsin ka peyva dijwar tê çi wateyê.

Ev pirtûk ji hêla Xaça Sor a Avûstralyayê (Australian Red Cross) ve hatiye nivîsîn.





Ev pirtûk li ser çi ye?

Ev pirtûk

- ji we re behsa **rewşên lezgîn** dike
- bernameya we ya lezgîn e.



Hûn dikarin di vê pirtûkê de zanyariyên bernameya xwe yê lezgîn binivîsin.

Wexta ku dema we hebe hûn dikarin beşên cuda yê bernameya xwe binivîsin.

Hûn dikarin zanyariyên pirtir li piştta pirtûkê binivîsin.



Hûn dikarin ji kesê ku pê bawer in bixwazin ku alîkariya we bikin.

Rewşa lezgîn çi ye?

Dibe ku rewşeke lezgîn

- Cidî be
- xeternak û tirsnak be.





Dibe ku hûn di rewşeke lezgîn û piştî wê de hewceyê alîkariyê bin.



Dibe ku lezgînî wiha be

- agirê çolê



- lehî



- qezaya erebeyê



- lezgîniya nexweşxaneyê




- qutbûna ceyran yan gazê.



Bizanin ku di rewşeke lezgîn de zanyariyan ji ku derê wergirin

Rewşeke lezgîn dikare biguhere û pêdiviya we ji zanyariyên baştirîn heye.

Hûn dikarin di der barê rewşên lezgîn de, ji beşên lezgîn û **medyayê** zanyariyan wergirin.



Dibe ku medya wiha be

- radyoya we ya herêmî ya ABC



- TV



- medyaya civakî

– Wek mînak, Twittera Polîs û Agirî.



Zanyariyên xwe binivîsin

Binivîsin ku hûn ê di rewşeke lezgîn de zanyariyên xwe ji ku derê wergirin.



Hêz û qasên xwe bizanibin

Eger bo we zehmet be, dibe ku hûn di rewşeke lezgîn de hewceyê alîkariya **pirtir** bin

- zanyariyan bixwînin û fêm bikin



- çalakiyên rojane bikin
 - wek mînak, bimeşin yan bibînin.



Zanyariyên xwe binivîsin

Tiştên ku mimkin e di rewşeke lezgîn de pêdiviya wan bi alîkariyê hebe binivîsin.




Ji bo hewcedariyên xwe yên bijîşkî bernameyê diyar bikin

Di rewşeke lezgîn de dibe ku hûn **nikaribin** ji
beşên xwe yên bijîşkî alîkariyê wergirin.

Hûn dikarin li bara van zanyariyên girîng binivîsin

- Xizmeteke bijîşkî ya piştî saetên karî
- şert û mercên xwe yên tenduristiyê
- dermanên xwe
 - wek mînak, dema ku hûn hebên xwe dixwin
- alîkariyên xwe yên bijîşkî.



Zanyariyên xwe binivîsin

Li ser hewcedariyên xwe yên bijîşkî
zanyariyan binivîsin.



Kî dikare alîkariyê bike?

Tora piştewaniya we dikare alîkariyê bike

Di rewşeke lezgîn de hûn dikarin ji **tora xwe ya piştewaniyê** alîkariyê wergirin.



Tora Piştgiriya tê wateya kesên ku hûn nas dikin û pê bawer in ku di rewşeke lezgîn de bibin alîkar.



Divê hûn ji 3 kesan yan zêdetir ku hûn dizanin di tora piştewaniya we de ne bipirsin.

Wek mînak

- malbat



- heval



- kesên li ser kar

- cîran



- muqatevan.




Hûn dikarin ji kesên di tora piştewaniya xwe de li bara van bibêjin

- bernameya xwe ya lezgîn

- hewcedariyên xwe



- bernameya xwe ak u hûn di rewşa lezgîn de gazî wan bikin.



Hûn dikarin kopyeke bernameya xwe bidin ji kesên di tora piştewaniya xwe.

Xizmetên lezgîn dikarin alîkariyê bikin



Di rewşeke lezgîn de dibe ku hûn hewceyê alîkariyê ji xizmetên lezgîn jî bibin.

Eger hûn di xetereyê de bin, hûn dikarin telefon bikin bo



Ambulansa Agir ya Polîsan

Telefon bikin bo hejmara 000

Eger bihîstin bo we zehmet e, dikarin telefon bikin bo TTY bi hejmara 106 ji bo şandina peyameke nivîskî.

Ji bo alîkariya lehî û bahoze hûn dikarin telefon bikin bo **SES** yan **Xizmeta Lezgîn ya Herêma Bakûr (Northern Territory Emergency Service)**

Telefon bikin bo hejmara 132 500



Bila lîsteya we ya têtîliyê hebe

Di rewşeke lezgîn de dibe ku hûn hewce bikin ku bi

- malbata xwe re



- tora xwe ya piştgiriya re têtîliyê dayînin.

Divê hûn ji zarokên xwe re bibin alîkar ku lîsteyeke têtîliya lezgîn jî binivîsin.



Zanyariyên xwe binivîsin

Nav û hejmarên telefonên kesên di malbat û tora xwe ya piştgiriya de binivîsin.



Herwiha hûn dikarin lîsteke têtîliya bijîşkî binivîsin.

Wek mînak

- nexweşxaneyê xwe

- dixtorê xwe



- dermanfiroşê xwe.



Zanyariyên xwe binivîsin

Ji bo têtîliyên xwe yên bijîşkî nav û zanyariyên têtîliyê binivîsin.



Di rewşeke lezgîn de dibe ku hûn jî hewce bikin ku bi beşên girîng re têkilî dayînin.

Wek mînak

- ceryan û gaz



- av

- înternet



- xizmeta muqateyê.



Gava ku van hejmaran li cîhekî nêzik hebin hûn ê kêmtir strêş hebin.



Zanyariyên xwe binivîsin

Nav û hejmarên tîlefonê yê beşên girîng binivîsin.

Ji bo rewşeke lezgîn bernameyê diyar bikin biçin cihekî



Di rewşeke lezgîn de dibe ku ew **ne** ewle be

- li mala xwe bimînin



- vegerin mala xwe.

Girîng e ku di rewşeke lezgîn de 3 cih hebin.



Dibe ku hûn biçin cihekî

- li derveyî mala we
 - wek mînak, nêzîkî qutiya nameyan



- li derveyî taxa xwe
 - wek mînak, meydana werzişê



- hûn dikarin demeke dirêjtir bimînin
 - wek mînak, bi hevalê xwe re.



Divê hûn

- li ser van deran bi kesên li mal û kesên di tora xwe ya piştevanîyê de li hev bikin
- bifikirin ka hûn ê çawa biçin her cihê
- li ser van bernameyan bi zarokên xwe re biaxivin.



Zanyariyên xwe binivîsin

Cihên ku hûn dikarin di rewşeke lezgîn de biçin binivîsin.

Bizandin çawa strêse birêve bibin



Di rewşeke lezgîn de û piştî wê dibe ku hûn **strêse** hîs bikin.



Strêse dikare bibe sebeb ku hûn li van hîs bikin

- Nexweşbûn



- bêhna we biçike



- hêrsbûn



- xemgînbûn



- westîbûn.



Ji bo ku di rewşeke lezgîn de kêmtir strêse hîs bikin


- nefesên kûr bikişînin



- bi awayekî erênî bi xwe re biaxivin
 - wek mînak, bibêjin **ez dikarim vê bikim**



- alîkariya kesên din bikin ku aram bimînin



- bila bernameya we ya lezgîn nêzîk be.



Zanyariyên xwe binivîsin

Tiştên ku hûn dikarin bikin binivîsin da ku di rewşeke lezgîn de kêmtir strêsa we hebe



Eger hûn her roj li xwe muqate bin, dibe ku hûn di rewşeke lezgîn de kêmtir strêş bigirin. Wek mînak, hûn dikarin

- tendurist û xweş bin



- bêhna xwe vedin



- wextê xwe bi heval û malbata xwe re derbas bikin.

Zanyariyên xwe binivîsin



Tiştên ku hûn dikarin di jiyana xwe de bikin binivîsin da ku di rewşeke lezgîn de kêmtir strêsa we hebe.



Ji bo hewcedariyên xwe yên sîgorteyê bernamêyê diyar bikin

Divê hûn **sîgorteya** durist wergerin.

Sîgorte peymaneke di navbera we û şîrketekê de ye.

Hûn fatûreyên sîgorteyê didin da ku di rewşeke lezgîn de bigirin.



Rewşeke lezgîn dikare

- bibe sebeba mesrefa we



- zîrarê bide mala we



- zîrarê bide erebeya we



- zîrarê bide tiştên ku ji bo we girîng in



- we ji çûna ser kar rawestîne.




Cûreyên sîgorteyê hene.

Wek mînak

- sîgorteya mal û kelmelên malê



- sîgorteya tenduristiyê



- sîgorteya erebeyê



- sîgorteya kar.



Zanyariyên xwe binivîsin


Ji bo şîrketên sîgorteya xwe nav û zanyariyên têkiliyê binivîsin.



Ji bo hewcedariyên xwe yên qanûnî bernameyê diyar bikin

Divê hûn **wesiyetekê** bikin.

Wesiyetname ji malbata we re dibêje eger hûn
bimirin dê çi bikin.



Hûn dikarin zanyariyên pirtir li ser wesiyetê ji
parêzerekî wergirin.




Zanyariyên xwe binivîsin

Nav û zanyariyên têkiliyê ji bo parêzerê xwe
binivîsin.




Ji bo heywanên xwe bernameyê diyar bikin

Herwiha girîng e ku bifikirin ka meriv çawa heywanên xwe di rewşeke lezgîn de muqate dike.



Wek mînak

- çawa heywanên xwe bibin



- heywanên we li ku derê bimînin



- heywanên we hewceyê çi xwarinê ne



- heywanên we hewceyê çi dermanan in



- çawa bi dixtorê heywanan re têkiliyê dayînin.



Zanyariyên xwe binivîsin

Zanyariyên li ser heywanên xwe û çawaniya muqateya wan di rewşeke lezgîn de binivîsin.



Nav û zanyariyên têkiliyê ji bo dixtorê heywanan binivîsin.



Qutiyeke amûrên lezgîn amade bikin

Girîng e ku **qutiyeke amûrên lezgîn** bi tiştên ku dikarin ji we re bibin alîkar ku

- di dema rewşa lezgîn de li malê bimînin



yan



- di dema rewşa lezgîn de ji malê derkevin.



Divê di qutiya we ya lezgîn ev hebin

- xwarina ku demeke dirêj dimîne
 - wek mînak, xwarina konsêrbûyî



- av bo 3 roj yan zêdetir



- cil.

Divê di qutiya we ya lezgîn de derman jî



- hebin



- meşaleyek û pîl



- tiştên ku ji bo we taybet in
 - wek mînak, wêne.



Hûn dikarin ji zarokên xwe bipirsin ka ew dixwazin di rewşa lezgîn de çi bibin.

Wek mînak, hirçeke pêlîstok.



Zanyariyên xwe binivîsin

Lîsteya tiştên taybetî yê li mala we ku hûn dixwazin bi xwe re bibin binivîsin.

Divê hûn kopiyên belgeyên girîng di qutiya xwe de biparêzin.

Wek mînak

- belgeya jidayikbûnê




- belgeyên sîgorteyê



- pasaport

- wesiyetname.



Herwiha divê hûn kopiyên belgeyên girîng li cihekî ewle û **dûrî** mala xwe biparêzin.

Wek mînak, bi kesekî di tora piştevaniya we de.




Zanyariyên xwe binivîsin

**Hûrgiliyên belgeyên xwe yên girîng
binivîsin.**



Ramanek baş e ku


- bila bernameya we ya lezgîn nêzik be



- kopiyeke bernameya xwe di qutiya xwe ya lezgîn de bihêlin



- ji malbat û tora piştevaniyê re bibêjin ku hûn qutiya xwe ya lezgîn li ku derê diparêzin



- Qutiya xwe ya lezgîn her sal kontrol û biroj bikin.



Zanyariyên xwe binivîsin

Binivîsin ku hûn ê qutiya xwe ya lezgîn li ku derê biparêzin.

___ / ___ / ___

Roja ku hûn ê qutiya xwe kontrol bikin binivîsin.




Meriv çawa alîkariya kesên din dike ku ji bo rewşeke lezgîn bernameyê diyar bikin

Hûn dikarin ji mirovan re van bibêjin

- çîroka xwe



- hûn li bara rewşên lezgîn de çi dizanin



- çawa bernameyê lezgîn çêbikin.



Zanyariyên zêdetir

Biçin li ser malpera me

redcross.org.au/prepare

A series of 26 horizontal lines for writing or drawing.

Hûn dikarin vê belgeyê tenê ji bo armancên xwe yên ne-bazirganî bikar bînin.

RediPlan ® nîşaneke bazirganiyê ya Australian Red Cross ye.

© Australian Red Cross, Adar 2018. Ev belavok mafê wê yê weşanê heye. Ji bilî li gorî bendên Qanûna Mafê Weşanê ya 1968an, nabe tu beşek ji vêya were bikaranîn.

Australian Red Cross ji bo hemû naverokên vê belgeyê mafê weşanê heye û her cure bikaranîn, kopîkirin yan jinûveweşandin bêyî destûra eşkere, nivîskî qedexe ye.

Ev weşan bi formata PDF ya guncaw li ser înternetê li vir heye redcross.org.au/prepare

